

Ji Edîtorî

Ji *Nûbihar Akademîyê* merheba.

Nûbihar Akademî bi hejmara xwe ya bîst û duyem li pêşberî we vekoler û akademîsyenên hêja ye. Cihê kêfxweşiyê ye ku *Nûbihar Akademîyê* bi vê hejmara xwe hem yazdeh salên xwe tamam kirine, hem jî di prosesa amadekirina vê hejmarê da anku di nav şeş mehên vê dawiyê da DOAJ di serî da ji çendîn îndeksên navneteweyî û bawerpêkirî yên niwanesaziyê qebûl wergirtine. Em di wê baweriyê da ne ku *Nûbihar Akademî* dê rêwîyatîya xwe ya akademîk bi îstîqrar bidomîne û di qada kovargerîya akademîk a kurdî da serkeftinên nû jî bi dest bixe.

Ev hejmara *Nûbihar Akademîyê* bi giştî ji neh gotaran pêk hatîye. Ji van gotaran sê heb li ser babeta dosyayê (medreseyên kurdan) û şeş heb jî li ser babetên giştî ne. Ji aliyê zimanan ve du gotar bi kurdîya soranî, yek bi kurdîya zazakî û yên dî jî bi kurdîya kurmançî ne.

Ji gotarên giştî yên vê hejmarê sê heb di qada edebîyata klasîk, yek di qada edebîyata modern, yek di qada ziman, yek jî di qada dîrokê da ye. Em ê li jêrê bi kurtî amaje bi naveroka van gotaran bikin:

Sevim Hatun Sürücü & Zafer Açar, gotara xwe ya kurmançî ya bi navê “Cotepeyv” di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da” li dor cotepeyvên ku di helbest û peşanê da ji bo xurtkirin û dewlendamkirina watayê ji aliyê edîb û nivîskarên ve serî lê tê dayîn amade kirine û ji bo selmandina vê diyardeyê *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* wek qada pratîkê hîlbijartine. Nivîskar gihîştine wê encamê ku Ehmedê Xanî bi 826 cotepeyvyan di sazkirina şewaza xwe ya edebî da ji vê kategorîya rêzimana kurdî sudeke mezin wergirtiye.

Önder Beyter, di gotara xwe ya kurmançî ya bi navê “Çavkanîyên Hizrî yên Feqîyê Teyran” da Îslamîyet, tesewif, mîtolojî, dîrok û efsane wek pênc kategorîyên serekî tesbît kirine ku ji Feqî ra bûne çavkanîyên hizrî û di peydabûna hunera wî da roleke girîng lîstine. Li gor encama ku Beyter bi dest xistîye dîn, civak, însan û siruşt jî çar temayên serekî yên helbesta Feqî ne ku bûna qada pratîzekirina van çavkanîyên hizrî.

Müjde Süleyman, di gotara xwe ya kurmançî ya bi navê “Berawirdkirinek di Navbera Menzûmeya Şêxê Sen’anî ya Feqîyê Teyran û Nezîreya wê ya Xemgînê Xanî” da xalên wekhev û cuda di navbera herdu menzûmeyan da ji aliyê naverok, teşeyên nezmê, serwa, erûz û qebareyê ve vekolane û gihîştîye wê encamê ku nezîreya Xem-

gînê Xanî a ku di sed sala XXem da hatîye nivîsîn, resenîya helbesta klasîk parastîye û asta wê ne kê mî asta berhema Feqîyê Teyran e.

Mehmet Yergin, di gotara xwe ya kurdîya zazakî ya bi navê “Şîrê Mela Ehmedê Xasî yê Kurdkî (Kurmanckî, Zazakî) û Tirkî” da helbestên Mela Ehmedê Xasî yên ku heta niha belawela bûn berhev kirine û nîşan daye ku Xasîyê ku bi dahênana mewlûda yekem a Zazakî navdar e di heman demê da di helbestê da jî şîyaneke wî ya bilind hebûye. Ji van helbestên ku hatine berhev kirin pênc heb bi kurdîya kurmanckî, yek bi kurdîya zazakî, yek bi tirkî û yek jî helbesteke pîrzimanî ye. Hêjayî gotinê ye ku ji alîyê Cegerxwînî ve amaje bi menzûmeyê Xasî ya bi navê *Cengnameyê Kurd û Ermen* jî hatîye kirin ku heta niha nehatîye tesbîtkirin.

Leyla Polat, di gotara xwe ya kurmanckî ya bi navê “Rêyên Pakkirina Trawmayê di Romanên Bextiyar Elî da” travmaya ku di esasê xwe da babeta psîkolojî û psîkanalîzê ye lêbelê paşê edebîyat jî tê da bûye babeta çendîn disîplînên cuda di mînaka Romanên Bextiyar Elî da vekolaye. Polatê pênc romanên Bextiyar Elî di peywenda rêyên pakkirina trawmayan da hilsengandine û gihîştîye wê encamê ku karakterên Bextiyar Elî tu carî derfetên terapotîk û psîkyatrîk ên pakbûnê bi dest nexistine û pakbûna wan bi rêya rêwîti, hogirtî, şîngirêdan û nivîsîne pêk hatine.

Karwan Salih, di gotara xwe ya kurmanckî ya bi navê “Kurd di Hizrên Kurdnasê Brîtanî Major Soaneyî da”, bal kişandîye ser kurdnasên Brîtanî yên ku di dîyarkirina dîroka kurdan û rewşa wan a sîyasî, aborî, komelayetî û zimanî da roleke giring lîstine û ji van kurdnasan Major Soane (1881-1923) kirîye babeta gotara xwe. Nivîskarî di gotara xwe da hizr û bîrên Major Soaneyî û xizmetên wî yên di biwarên ziman, edebîyat û rojnamevanîya kurdî da dîyar kirine.

Gotarên **Krekar Aziz**, (Hucre le Nawçey Xoşnawetî), **Hêriş Kemal Rêkanî** (Keşkolên Helbestên Kurdî li Medreseya Qubehan) û **Rizgar Cabbarî** (Rolî Tekyey Talebanî le Perepêdanî Meqamatî Kurdî da) derheqê babeta dosyayê anku medreseyên kurdan da ne. Em ê di pêşekîya dosyayê da derheqê van gotaran da zanyarîyên berfireh pêşkêş bikin.

Herî dawî em dixwazin ragihînin ku dosyaya hejmara bê ya *Nûbihar Akademîyê* (hejmara bîst û sêyem) dê li ser babeta “Vegêrana Gelêrî ya Kurdî” be û Doç. Dr. Keenan Subaşî dê edîtorîya dosyayê bike.

Bi hêvîya ku em di hejmara bê da bi naverokeke dewlemend li pêşberî we vekoler û akademîsyenên hêja bin.

Heta wê demê bimînin di nav xêr û xweşîyê da.

Prof. Dr. Abdurrahman Adak
Edîtorê Giştî

Editorial

Greetings from Nûbihar Academy,

Nûbihar Academy proudly presents its twenty-second issue to you, esteemed researchers and academics. It is a great pleasure to share that with this issue, Nûbihar Academy marks its eleventh anniversary. During the preparation of this issue—or rather, over the past six months—the journal has been recognized by several international and reputable indexes, including DOAJ. We are confident that Nûbihar Academy will continue its steady academic journey and achieve new milestones in the field of Kurdish scholarly publishing.

This issue features a total of nine articles: three focused on the special issue (Kurdish madrasas) and six on general subjects. Regarding language distribution, two articles are in Sorani Kurdish, one in Zazaki Kurdish, and the rest in Kurmanji Kurdish.

The general articles in this issue cover diverse fields: three in classical literature, one in modern literature, one in linguistics, and one in history. Below is a brief summary of their content:

Sevim Hatun Sürücü & Zafer Açar, in their Kurmanji article “*Reduplication in the Mem û Zîn of Ahmadi Khani*,” examine the use of *cotepeyv* (reduplication/doubling)—a rhetorical device employed by writers and poets to enhance and enrich meaning in poetry and prose. Using *Mem û Zîn* by Ehmedê Xanî as their case study, the authors demonstrate that Xanî employed this technique extensively, utilizing 826 instances of *cotepeyv* to craft his distinctive literary style.

Önder Beyter, in his Kurmanji article “*The Intellectual Sources of Feqi Teyran*,” identifies Islam, Sufism, mythology, history, and legend as five key categories that served as intellectual foundations for Feqi and played a significant role in shaping his art. Beyter concludes that religion, society, humanity, and nature are the four central themes of Feqi’s poetry, reflecting the application of these intellectual influences.

Müjde Süleyman, in his Kurdish article titled “*A Comparison between the poem Sheikh Sen’anî by Feqiyê Teyran and its parallel poem by Xemgînê Xanî*,” explores the similarities and differences between the two poems in terms of content, verse forms, melody, rhythm, and structure. He concludes that *the poems* by Xemgînê Xanî, writ-

ten in the 20th century, preserves the authenticity of classical poetry and matches the literary quality of Feqiyê Teyran's work.

Mehmet Yergin, in his Zazaki article titled *"The Poetry of Mela Ehmedê Xasî in Kurdish (Kurmancki, Zazaki) and Turkish,"* compiles previously scattered poems by Mela Ehmedê Xasî. Yergin highlights Xasî's renowned creation of the first Zazaki *mewlud* and demonstrates his exceptional poetic talent. Among the poems collected, five are in Kurmanji Kurdish, one in Zazaki Kurdish, one in Turkish, and one is multilingual. Notably, Yergin mentions that Cegerxwînî refers to a Khasi poem titled *Cengnamey Kurd û Ermen*, which remains unidentified.

Leyla Polat, in her Kurmanji article *"Paths to Trauma Healing in Bextiyar Elî's Novels,"* examines trauma, a subject rooted in psychology and psychoanalysis but increasingly explored in literature, using the novels of Bextiyar Elî as a case study. Polat analyzes five of Elî's novels to explore methods of trauma purification and concludes that Elî's characters, unable to access therapeutic or psychiatric resolution, find healing through alternative means such as travel, hobbies, mourning, and writing.

Karwan Salih, in his Kurmanji article *"Kurds in the Thoughts of the British Kurdologist Major Soane,"* sheds light on British Kurdologists who significantly contributed to documenting Kurdish history and their political, economic, social, and linguistic contexts. Focusing on Major E. B. Soane (1881–1923), Salih delves into Soane's reflections and contributions to Kurdish language, literature, and journalism.

Additionally, the articles by **Krekar Aziz** (*Hucra le Nawçey Xoşnawetî/ The Cell in the Land of Joy*), **Hêriş Kemal Rêkani** (*"Kurdish Poetry Scholars at the Qubehan Madrasa"*), and **Rizgar Jabbari** (*"The Role of Talabani Tekye in the Development of Kurdish Maqams"*) focus on the special theme of Kurdish madrasas. Detailed insights on these articles can be found in the introduction to the special issue.

Finally, we are pleased to announce that the next issue of Nûbihar Academy (Issue 23) will focus on the topic of "Kurdish Folk Narratives" with Assoc. Prof. Dr. Kenan Subaşı serving as the editor of the special issue.

We look forward to presenting you with another issue full of valuable content and academic insight. Until then, we wish you inspiration and well-being in your academic pursuits.

Prof. Dr. Abdurrahman Adak
Editor-in-Chief